


Di gihîştina Norwecê de lêpîrsîna li ser jana zirav (TB)

Her kesekî ku wek serîlêderê penahberîyê an jî wek penahber were Norwecê, divê ji bo jana zirav (TB) were mi'ayenekirin. Eger ku ji welatekî lê jana zirav belavbûyî ye bîn, ji koçberên din re jî miayene divê. Mi'ayene ji X-rayeka pişî (X-rama sîngê) û testa xwîynê an jî çermî pêk tê.


X-rama sîngê:

X-rayeka sîngê bi tenê çend deqîqeyan diajo û dê hîç zirarê nede we. Bûyîna X-rayê ewle ye, tevî ku hûn ducanî bin jî. Derxistina cilên we yên serî ji bo bidestxistina wêneyekî X-rayê ya herî baş e. Eger hûn bixwazin, hûn karin êlekekî tenik an tîşortekî bêyî deq an nexş li xwe bikin. Sudyen jî divê were derxistin. Dema ku X-ray were kişandin, we divê hûn bêhna xwe bikişînin û di sînga xwe de bihêlin.




Ji hin mirovan testa xwîynê an testa çermî tê wergirtin.

Testa xwîynê (IGRA):



Testa çermî (Mantoux):



Hûn ê encamên testê di wê gavê de bi dest nexin. Ew ê çend rojan biajo. Dibe ku test nîşan bidin ku pêdivêya we bi hin mi'ayeneyên bêtir jî hebe an jî we bivê hûn bi dixtorekî re biaxifin. Di wê rewşê de, dê bi we re têkilî were kirin. Maneya wî îlla ew nîne ku jana zirav li we ketiye.

Di nava nîşaneyên jana zirav de kuxika daîmî (ya sê hefte an bêtir diajo), kelîna laşî, lawazbûn, hisîna bi bêtaqetîyê an westîn, xweyêdanên şevê an werm an girêka di sitûyê we de, di hêlikê we de an di binê milên we de. Dibe ku bêyî ketina bi nexweşîyê jî bakterîya jana zirav di laşê we de hebe. Bi tenê jana zirav a dermanekirî ya di pişî de (jana zirav a sîngê) kesên din nexweş dixîne. Eger ku bi we re jana zirav hebe, hûn ê li Norwecê belaş werin dermankirin. Heta ku dermankirina we bi dawî were dê mafê we yê mayîna li Norwecê hebe.

Bera di bîra we de be ku jana zirav kare were dermankirin! Ji bo zanarîya bêtir li ser jana zirav, herin vê derê; www.fhi.no